



Koronavayrusa Nû

Li 10.3.2020 hate nûkirin

Em çawan xwe biparêzin



Danasîna daneyan

Agahiyên girîng ser koronavayrusa nû û kampanyaya "Em çawan xwe biparêzin".

Hûn çi dikarin bikin?



Destên xwe baş bişon.



Di destmalekê yan nava enîşka xwe de bikuxin an bibênijin.



Jev dûr bin.



Dest nedin hevdu.



Eger taya û kuxika we heye li malê bimînin.



Tenê piştî tomarkirina telefonî serdana nivîsgeha bijîşkan an beşa lezgîn bikin.

Berbelavtirîn pirs û bersivên ser koronavayrusa nû

Jêgîrbûn û metirsî

Çima ev rêzîkên paqijiyê û reftarê gelekî girîng in?

Koronavayrusa nû vayruseke nû ye ku hîn pergaleke ewle ya mirov tuneye. Gelek tûşbûn û nexweşî dikarin hebin. Loma, heya ku mimkin e em divê belavbûna koronavayrusa nû kêmtir bikin.

Bi taybet kesên ku metirsiya zû nexweş ketina wan heye divê werin parastin. Ew jî kesên ji 65 salî jortir û kesên kuberê nexweşiya wan hebûye ne: Tansiyona jorê ya xwînê, nexweşiya şeker, nexweşiyên dil û damarî, nexweşiyên demdirêj ên bêhnkişandinê, pencşêr û nexweşî û dermanên ku pergala ewlebûna bedenê lawaz dikin.

Eger em rêzîkan bişopînin, em dikarin van kesan baştir biparêzin. Bi vî karî, em arîkariyê jî didin ku kesên xwedan nexweşiyên giran li cihên muqatebûna tenduristiyê baştir werin dermankirin. Ji ber ku yekeyên muqatebûna taybet, odayên dermankirinê û dezgehên hewadanê qasa wan kêmtir e.

Kî li ber metirsiyê ye?

Nexweşiya bi koronavayrusa nû ji gelek kesan re bê zîyan e. Kesên ji 65 salî jortir û kesên xwedanê yek ji van mercên jî berê ve heyî pirtir li ber metirsiya giran a nexweşiyê ne:

- Tansiyona jorê ya xwînê
- Nexweşiya şeker
- Nexweşiyên dil û damarî
- Nexweşiyên demdirêj ên bêhnkişandinê
- Nexweşî û dermanên ku pergala ewlebûna bedenê lawaz dikin
- Penceşêr

Gelo hûn dikarin li Swîsê tûşî koronavayrusê bibin?

Erê, metirsiya girtina koronavayrusa nû li Swîsê pirr dibe.

Koronavayrusa nû çawan tê veguhestin?

Koronavayrusa nû pirtir bi rêya bi hev re bûna demdirêjê tê veguhestin: Eger hûn bi kesekî xweş re ji 2 metroyan kêmtir û ji 15 xulekan pirtir bin. Veguhestin bi rêya çilkên avê pêk tê: Eger kesê nexweş bibênije yan bikuxe, vayrus dikarin rasterast bikevin nava perikên bêvilê, dev yan çavên kesên din. Li bara destan: Dilopkeyên kuxîn û bînjînê dikarin ser destan bin. Dema hûn dest li dev, bêvil yan çavên xwe didin ew dikevin wir.

Nîşane, têderxistin û dermankirin

Nîşaneyên nexweşiya koronavayrusa nû çi ne?

Nîşaneyên herî berbelav ta, kuxik û bi dijwarî bêhnkişandin in. Ev nîşan dikarin ji hêla giranbûnê ve cuda bin. Dijwarî jî dikarin hebin, wek mînak zîngêş. Hin kesên tûşbûyî pirsgirêka wan a helandina mehdeyê yan çavan jî heye (werimîna çavan).

Ta û kuxika min heye, divê çi bikim?

Eger nîşaneyên we yê nexweşiyê hebin, hûn divê li malê bimînin bo ku kesekî din tûşî nekin.

Bi nîşaneyên nexweşiyê em dixwazin bibêjin:

- Ta (taya bedenê ji 38 ° C pirtir û digel westîbûnê be, carinan jî êşa masûleyan)
- Kuxik ziwa be û renga bi gewrîfêşê re be

Eger nîşane navgîn bin, hûn dikarin li xwe muqate bin. Heya 24 demjimêran ku nîşaneyên we kêmbibin ji malê dernekevin, bo ku hûn kesekî din tûşî nekin. Rêzikên paqijiyê û reftarê raçav bikin (li rûpela yekem binêrin "hûn çi dikarin bikin?").

Eger hûn li ber metirsiya pirr a nexweşiya giran in yan eger nîşane giran dibin: Ji bijîşkê xwe re telefon bikin. Ew ê biryar bide ka gelo lînêrîna bijîşkî pêdivî ye were kirin an bes dike li malê bimînin û li xwe muqate bin.

Nexweşiya koronaya nû çawan tê dermankirin?

Niha tu dermanê nexweşiya koronavayrusa nû tune. Derman tenê di qasa rakirina nîşaneyan kêmsînore. Kesên nexweş ji bo parastina kesên din tîncudakirin. Eger nexweşî giran be, bi gelemperî xwedîkirina li yekeya beşa taybet pêwîst e. Renge badayîna sexte pêwîst be.

Kiryarên parastinê

Li dema seferê çi girîng e?

Hemahema gişt deverên dinyayê li ber metirsiya girtina koronavayrusa nû de ne. Heya niha, Rêxistina Cîhanî ya Tenduristiyê tu kêmsînoriyên seferê ranegihandiye. Li gelek firokexaneyan kiryarên çavdêriyê bo rêwiyan zêde bûne.

Dema seferê dikin tewsiyeyên paqijiyê û reftarê bişopînin. Ev dikare arîkar be we ji tûşbûna koronavayrusê biparêze.

Gelo hûn ji 65 salî jortir in an ji berê ve nexweşiya we heye (tansiyona jorê ya xwînê, nexweşiyên demdirêj ên bêhnkişandinê, nexweşiya şeker, nexweşiyên dil û damarî, nexweşî û dermanên ku pergala ewlebûna bedenê lawaz dikin û penceşêr)? Bi taybet bo kesên zîyanbar guh bidin tewsiyeyan.

Li hin welatan dever hene ku hatine varêzkirin. Ketin û derketina wir – eger jî qet nebe – bi destûra taybet mimkin e. Em nikarin texmî bikin ev kêmsînoriyê û rêzik dê heya kingê hebin.

Rêwî dikarin li firokexaneyên navneteweyî li bendî kiryarên zêde yê çavdêriyê bin.

Xeta agahiyên bo kesên tîncudakirinê:

Gelo nîşaneyên we hene (bi dijwarî bêhnkişandin, kuxik, ta), dixwazin bikevin nava Swîsê û pirsên we yê bijîşkî hene? Telefon bikin: +41 (0)58 464 44 88

Agahiyên ser pirsên bijîşkî bo sefera we:

www.safetravel.ch

Beriya ku hûn seferê bikin, li bara kiryarên niha pêk tîncudakirinê ji **balyozxane yan konsulxaneya welatê armanc** pirs bikin ([Malpera DA > Nûnertiya biyanî li Swîsê](#)).

Koronavayrusa nû çi ye? SARS-CoV-2 çi ye û COVID-19 çi ye?

Koronavayrusa nû li dawîya sala 2019 ji ber zêdebûna derasayî ya nexweşîya sîngêşê li bajarê navendî yê Çînê Wuhan`ê hat dîtin. Navê SARS-CoV-2 li vayrusê kirin û ji heman malbatê ye ku patojenên "Sendroma Bêhnikîşandinê ya Rojhilata Navînê" MERS û "Sendroma Bêhnikîşandina Gelekî Diwar" SARS ye.

Li roja 11 Sibata 2020`î, Rêxistina Cîhanî ya Tenduristiyê bi awayê fermî nav li vê nexweşîya ji koronavayrus kir: COVID-19, kurteya «nexweşîya koronavayrusa 2019» yan bi Almanî Coronavirus-Krankheit 2019.

Agahiyên ku niha hene nîşan didin heywanan ev vayrus derbasî mirovan kirine û niha ji kesekî li kesekî din tê veguhestin. Jêdera wê ya xwecihî ihtimal e masiyek û bazareke heywanan li bajarê Wuhan`ê be, ku ji wê hingê ve rayedarên Çînê girtiye.

Agahiyên pirtir:

www.bag-coronavirus.ch
www.bag.admin.ch/neues-coronavirus
(Almanî, Fransî, Îtaliyayî, Inglîsî)



Schweizerische Eidgenossenschaft
Confédération suisse
Confederazione Svizzera
Confederaziun svizra

Swiss Confederation

Bundesamt für Gesundheit BAG
Office fédéral de la santé publique OFSP
Ufficio federale della sanità pubblica UFSP
Federal Office of Public Health FOPH